# Efrîn di bin dagîrkeriyê de (83):
## Wendayiyên bi zorê, revandî û girtî, di bin buveya vegirtina "korona" de ne...Tewankirin û binpêkirin berdewam in



"**Veyrûsa korona ya nûderketî**", rewşine zortir bi ser ên, ku di bin dagîrkerî, binpêkirina milîsên tundrew û kirîzên salane yên welatê me de dijîn, peyda kirin. Bi ser tirsa cîhanê ji belavbûna korona, û mijûlbûna hemî milet û dewletan bi çawabûna tunekirina wê; Hîn binpêkirin û tewankirin , li Efrînê berdewam in.

Lê, yê ku, xelkê pir ditirsîne, buveya vegirtina bêtirî /1100/î ji lawên wan ên girtî, wendayiyên bi zor û revandî û çarenûs ne xuya, herweha jî yên ku, bi sedan di zîndanên asayêş û artêşa niştîmanî ya sûrî "elşurte we elceyş elwetenî elsûrî" de, bi veyrûsa korona ye. Ji ber ku, ew zîndan bê perensîpên tenduristî û parastinî ne.

Ji bîr nebe, ku piraniya yên girtî, revandî û wendayî sivîl in û hin ji wan jî jin û temenmezin in, û bi tuhmeta têkliyê bi rêbebiriya xweser a berê re, yan jî bi tuhmetin çêkirî, hatine girtin an revandin. Ew yeka dihêle, ku ew girtin weke girtinên tewşankî, bêsûcane û siyasî werin jimartin, destlatên dagîrkeriya Turkiyê di ber de berpirsiyar werin dîtin, û tersbûneke mezin ji benda /70/ ê ji hevpeymana Cinêfa çaran a /1949/an re be. Ya ku, rê nade dewleta dagîrker, ku dest dîne ser kesên parastî yan wan bide dadgehkirin an wan bi sedema ku, berî dagîrkirinê Karin kiribin an nêrînin dabin gunehkar bike.

Ji wan kesên bi zor wendayî, hemwelatî "Nûrî Ibrahîm Cabo" ye , yê /42/ salî , ji gundê Qirigolê - navça Bilbilê , û ji Nîsana /2018/an.z girtiye. Hêjaye bi bîr were, ku girtin berdewam in, heya ku hin caran girtina kesekî û bi heman tuhmetan dubare bibe. Yanê yên ku, berê bi /100 - 200/ hezar L.S hatibin berdan, careke din li pêş "dadgeha sezayê" têne dadgehkirin, û bi zîndankirin û pereyine din têne cezkirin.

**Girtinên ku nû çêbûne û gihane me ev in:**

-Li 17.3.2020an z , hemwelatî "Şêxmûs Mihemed Elî" ji xelkê gundê Ereba - navça Mabeta , li bajarê Efrînê hate girtin.

-Li 18.3. 2020an z , hemwelatiyê bi navê "Hebeş Behcet Hebeş" ji gundê "Ereba"- N. Mabeta , li devera pêşesaziyê ya bajarê Efrînê hate girtin.

-Li 24.3.2020an , "Kîbar Mihemed Kolşo" , li navenda navça Mabeta hate girtin.

-Li 23.3.2020an , hemwelatî "Ridwan Henan Hesen" ji gundê Miskê - navça Cindirêsê, ji ciyê kar, li navenda bajarê Efrînê, ji aliyê milîsên çekdar ve, hate revandin, û ta niha çarenûsa wî ne diyar e.

-Li 26.3.2020 an z , hemwelatî "Luqman Şêxmûs" yê /41/ salî, ji gundê "Qestelê Kêşik" - navça Şera, ji aliyê milîsên "Lîwa'i Elsultan Mûrad" ve , hate revandin, û ta niha çarenûsa wî ne diyar e.

-Wendabûna " Ehmed Elo " yê /39/ salî , ji gundê Mistika - navça Şiyê, ji heftakê ve, li Istanbûlê, û gûman heye ku, ew li ser destê asayêşa Turkiyê -dema lêvegera wî ji nexweşxanak hikometê re - li piş raporên tolhildanê yên, ku li Efrîne li ser rabûne de, hatibe girtin .

**Hin binpêkirin û tewanin din:**

-Gundê "Îska" yê ku li Başûrî Efrînê dikeve, ji /250/ malî pêk tê, û dora /125/ mal ji wan li gund man e. Lê , milîsan /800/malbat ji yên bi anîndin dane, û di malên vala û kon û çadirên , ku li nav û dora gund venane de nişte kirin.

-Milîsên "Elasî - Lîwa'i Semerqend", li gundê "Firêriyê" - navça Cindirêsê, dest danî ser /1000/ darên zeytûnê, yên " Dr. Xelîl Husên Hac Ebdo" ji gundê " Kefirsefrê"- N.C û niha li Almaniya rûdine.

-Li gundê "Coqê"- Efrîn, milîsa"Firqit Elhemzat" vêrgiyên mehane /2500-5000/L.S li xwediyên firoşxane û tirektoran ferz kir, ji bilî, ku berê jî ji du salan ve, /500/L.S mehane û /500/ jî ji bo paqijiyê li her malekê dixin.

-Li gundê "Şêx" - navça Reco, piştî ku, artêşa Turkiyê ya dagîrker derbas gund bû , bargeheke leşkerî li sirta "Kaziyê" ya li rex gund çêkir. Di encam de, /300/ dar zeytûnê yên hemwelatî "Husên Henan" û dora/200/ î jî yê "Ebdo Şêx Ebdî" ji holê rakir, ziyanin din jî gihand zeviyên derdorê , û sala borî bargeh ji hev hate şelandin.

-Me di rapora çûyî de, çêra qutkirina daristana "Tîngtîngê" kiribû, lê me bi şaşbûn gotibû, ku ew li Başûrê gundê "Qere tepe" - Efrîn dikeve. Ya rast ew e, ku ew li Bakurê gund dikeve. Herweha, milîseyan daristana "Qestel" ê jî - ya ku, li Rojavayê daristana "Tîngtîngê" dikeve û li sala /1974/an hatiye çandin - qutkirin, û koçberên gundewarên Idlib û Heleb, bi awakî berdewam û bi kirê, li wir bi cî dikin.

Herweha serberdan û çêrandina keriyên pêz û dewaran li piraniya çarçewa herêma Efrînê û gihandina ziyanê bi darên zeytûn, fêkî û çandiniyê, bûye diyardeyek. Xwedî û şivanê pez û dewaran ên ku bi zorê hatine bi cîkirin çekhilgêr in. Wê lomê, kes newêre li pêşiya wan bisekine û biqewtîne, yan gilî bike. Û piraniya giliyên dibin jî, tu encamên razîbûnê jê dernakevin. Nimûne, li derdora gundê "Celemê" - navça Cindirêsê, li kêlek riya "Efrîn - Reco", û li deştên "ziravkê û Avrazê - Mabeta" - bi taybetî pirbûna geya û şînkahiyê li nav gelek zeviyên ku, bi sedema baranê û buhabûna mazotê nehatine ajotin- gelek keriyên pêz û dewaran hene. Bi ser ku, Odeya çandiniyê ya ku bi "odeya şaxa zeytûnê" tê navdan, li 19.3.2020an, giştînamak durveyî ji bo qedexekirina çêrandinê di nav mal û milkên xelkê de derxist , lê, milîsan û nişteciyên hatine bi cîkirin tu guh nedanê. Ne tenê weha jî, milîs zeviyên di bin destlatiya wan de , bi kirê û ji bo çêrandinê didin xwediyên pêz û dewaran.

Û ji alîkî din ve, dagîrkeriya Turkiyê û nandozên wê, bombebarankirina xwe li ser gund û bajarokên "Şêrewa û Şehba" - Bakurê Heleb, yên ku, bi koçberên Efrînê mişt berdewam dike. Li 26.3.2020an, bajaroka "Til Rifetê" bombebaran kir, "Ebid Elrehman Ibrahîm" ji gundê "Kotana"- navça Bilbilê birîndar kir, û ziyanin din gihandin boriyên ava vexwarinê û hin mal û mewalan. Û li 23.3.2020an jî, derdora gundê "Um Hoşê " bombekir û hemwelatiyek temenmezin birîndar kir.

Di herdu rojên borî de, ji bo tiştên dizîn û çarçewa bandorbûnê, pevçûnên giran bi çekên sivik û orte, di nav milîsên "Elcebhe elşamiyê" û "Lîwa'i 51" ê de, li taxa "Eşrefiyê" û geroka "Kawa", li hundir bajarê "Efrînê" derketin holê, hin kuştî û birîndar encam dan , û tirs di nav xelkê de peyda kirin.

Vêca, xelkê Efrînê bang li hikomet û rêxistinên girêdayî rewşa Sûriyê, û emîndariya giştî yê "Komîta Netewên Yekgirtî" û saziyên pêve girêdayî dikin; Da ku, bi lez bilivin û fişarê li Hikometa Turkiyê bikin, ji bo lawên wan ên girtî û revandî serbest berde; Bi taybetî veyrûsa "Korona", jiyana girtiyan pir buve dike. Herweha, ew tekez dikin, ku zaroyên wan bê sûc in, tu tewan di dermafê tu kesî yan dewleta Turkiyê de nekirine, û tu mafê kesî li cem wan tune ye.

28.03.2020an

**Nivîsgeha ragihandinê- Efrîn**
**Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**

…………………

**Wêne:**

-Girtiyê bi zor wendayî "Nûrî Ibrahîm Cabo."
-Cîgeha daristana "Qestel" ê , berî û piştî qutkirina daran.
- Hemwelatiyê revandî "Ridwan Henan Hesen".